

## Fîlma av û hewayê > Kiryarên kêrhatî

Bandoreka ku li av û hewayê guherînan pêk tîne çî qasî bi girseyî girêdayî vê yekê ye ku em çawan asta çêkirina gazên gulxaneyî kêr bikin. Beriya her tiştî, divê em vejerin ser vejen û enerjîya dosta av û hewayê û vejen/enerjîyê bi awayekî kêrhatîtir bi kar bînin. Em gerek teknolojiya azmûndayî û testkirî bi kar bînin, teknolojiya tezebûyî çêbikin, bizanin ka kîjan kar baştir bersivê didin, her wiha van teknolojiyan li her welatî berbelav bikin. Kiryarên bo av û hewayê hetanî asteka mezin ê li bara siyasetê bin. Di heman demê da, bi giştî hêsan e ku meriv berpirsariyê biavêje ser stuyê ``pergalê``. Wê demê meriv dikare pîne bike ku wekî berê mesrefê bidomîne, lê serhev, arîkariya me tenê wekî dilopekê di pehnavekê da ye. Lê dîsan jî, bikaranîna berheman, germkirina malan, erebeyên bo hatin û çûyîna dibistanê û kar, sefer û zibil jî hêmanên girîng ji vê rewşê ne. Hûn çî dikarin bikin bo ku johaneka dosta av û hewayê hebe?

Beriya ku hûn fîlmê bibînin, karên ku hûn gerek bikin ev in:

1. Mînaka kiryarekê bidin ku dikare asta CO2`yê kêr bike.
2. Hûn bixwe çî dikarin bikin sa ku asta CO2`yê kêr bibe?

Erk û karên têkildarî fîlmê:

1. Du mînakan ji wan welatan bidin ku bo her serê kesî vejen û enerjîya pirtir bi kar tînin û her wiha du welatên ku kêr bi kar tînin. Çima hûn fikir dikin ku ev welat asta wan a bikaranîna enerjîyê ji hev cuda ye?
2. Norvêj her salê bo her kesî 8.5 ton mêtira sêca dirav xerc dike, lê reqemên pêwendîdar li Swêdê 5 ton e. Çima em li Norvêjê ji Swêdê pirtir gaza CO2`yê çêdikin?
3. Em çawan dikarin bikaranîna vejen/enerjîya xwe biguherin sa ku em CO2`yê kêr çêbikin?
4. Bingeha sereke ya ku çawan selûlên tavî yê modern kar dikin şirove bikin.
5. Çima lêkolîna ser selûlên tavî dikare arîkareka girîng bo kêrkirina CO2`yê be?
6. Li Mongstadê, zanyarên lêkolîner bi wergirtin û zexîrekirina kerbonê(CCS) ra kar dikin. Beriya ku ev teknoloji bikaribe were bikaranîn, çî astengî gerek bînin rakirin?
7. Hûn wekî kesekî/ê d jiyana xwe ya asayî da çî karî dikarin bikin?
8. Hûn çawan dikarin ser biryarên siyasî ku karên bo kêrkirina CO2`yê xurt dikin, bandorê dayînin?

## Erk û karên xurtbûyî:

1. Bibêjin ka zibil û asta zibilê îro û li vê serdemê dibin sebeba zêdebûna CO2`yê?
2. Çi kar sa zibilê û kêmkirina asta zibilê dikare bo kêmkirina CO2`yê arîkariyê bide?
3. Fikir bikin ku hemî malbatên li Norvêjê bixwazin çûyîn û hatina bi erebeyên xwe yê ferdî hetanî 50% kêmkirin. Ev yek ê çî dûhatên wê ji we ra hebin?